

Te jî

ev bihîst?



Şîdeta nav malê

me hemûyan eleqeder dike.

Cîrantîyek hesas

tedbîrê herî çêtir e.

Ji bo gelek kesan mala wan her tim ne cîhekî ewle ye. Û şîdeta nav malê ne meseleyekî şexsî ye, lê sûc e. Şîdet dikare bi gelek awayên cûda pêk were. Mînak, wekî lêdan, û wekî din jî bi rêya tehdîdan ve psikolojîk, bi rêya destavêtinê ve cînsî, yan jî bi rêya kontrola finansî ve ekonomîk.

Eger di mala cîranêkî we da şîdeta nav malê hebe gerek mîrov çi bike



Eger hûn pê dihesin ku ev ne „mînaqêşeyek normal e“, vê yekî ihmal mekin. Hişyar bimînin. Bi cîranên din re li ser vê mesele bipeyivin.



Îlanên sazîyên alîkarî yê derdorê we li ser dîwara korîdorên bînayê ve darbixin. Yan jî nîşeyên (kaxizên) ku li ser wan de nimreya **telefonê alîkarî 08000 116 016*** ya federal heye çap bikin û bo mînak hûn dikarin wan nav qutîyên postê bavêjin.



Bi kesê têkîldar re bipeyivin û bi baldarî jê bipirsin ka her tişt baş e. Jê re alîkarî pêşkêş bikin (ji bo serlêdana doktor, navbeynkarî ji bo navendên şêwirmendiyê). Ya girîng ev e ku hûn bi kesê têkîldar re bi tenê bipeyivin. Eger ev kes tu tişt qebl nake, dîsa jî nehêlin ku ev rewş çavê we bitirsîne.



Hewl bidin ku ev rewşên lihevnehatinên dijwar bisekine. Bi bihaneyek wekî ka li cem wan ard yan jî hêk heye zengilê deriyê wan lexin. Girîng: Eger hûn xwe di nav bêewlehî da hîs dikin, çêtir e ku hûn hema bangê polîsê bikin.



Eger rewşa ku di kêleka we de pêk tê xeter dibe, divê hûn qet teredût nekin. **Bi nimreya 110 telefonê polîsê acil bikin.** Telefon kirina we dikare jiyanan xelas bike.

**bêpere, 24 saet vekirî,
17 ziman, hilfetelefon.de*

Versiyona Îngilîzî:



Landespräventionsrat
Niedersachsen



Niedersachsen. Klar.